# Jîn



Her Heyva Çirîa Dûê (heyva yazde) Emrîkî "Cejina Supasîê" pîruz dikin. Cejina Supasîê êk ji mezintirîn cejinêt Emrîkî ye. Li vê rojê ji ber xêr u pîruzkirin yêt Xwidê em supasîa Xwidê dikîn. Cejina Supasîê ya ewilî pîruzkirneka supasîa bu Xwidê bî çunku li demê zivistaneka sarr Xwidê berhemekê baş u xwarin daî. Eve çîroka he ya mêjua Cejina Supasîê ye.

## "Cejina Supasîê" ya Emrîkî




Miruvêt "sur" li Emrîke hebîn 300 sala ji berî miruvêt "spî" biênê. Ew Hinduk bîn u li ser ħemî qarayêt Emrîka ya Bakur u Başur jîan. Dîmahîê salêt 1400, welatêt Ewrope zelam u gemî virêkirin da rêkêt Asîa bibînin çunku divîa filfil u biharet u perukêt can u tiştêt dî bikirrin. Navbeyna sala 1500-1900, ew welatêt Ewrope li gel êk u dû berêkanê dikir da mêtingeha deynanê bidin. Zelamek ji welatê Îtalîe bî, navê wî Kristoforo Kolombo (bi Inglîzî "Kristefir Kelembes"). Kolomboî bu welatê Îspanîa şul dikir u li sala 1498 Kolombo geheşte qara Emrîka Bakur. Piştî hingê tijî miruvêt Ewrope hatine Emrîke da bijîn. Rêka wan bi gemîa gelek xeter u zeħmet bî.

Li demê salêt 1500 miruv li welatê Inglîzî bîn, navêt wan "Ḧecî" bîn. Ḧecî bawerîa 'Îsaî u Incîlî dikirin. Belê paşayê Inglîzî destur dijî Incîlî dane u Ḧecîa ħe jê ne kir. Dîmahîê bi sala 1618 ħemî Ḧecîa ji welatê Inglîzî derketin u çûne welatê Holendî.

Li Holendî Ḧecî serbestîya dînî u ya îbadetkirnê hebî. Belê divîa bi zimanê Inglîzî îbadetê bikin u ħemî biçîkêt xu zimanê Holendî fêr dibîn. Ḧecî jî muhacir li welatê bîanî bîn u pare ji şulêt wan kêm bî. Bi vî awayî brîar da ji Holendî derbikevin u bi gemîê biçine Emrîke u jîanêt xu careka dî dest pê bikin.

Li sala 1620 Ḧecî ji Holendî li ser gemîekê derketin. Navê wê "Mêyflewer" (kulîlka gulanê) bî. 102 miruv li ser gemîe bîn. Li heyva duzde geheştin Emrîke u li **Kêp Kad** deyna. (Seħ ke nîşana sur li nexşa "13 Colonies".)




**Kêp Kad** www.law.indiana.edu

Ḧecî nav li menteqa xu "Plimez" kir. Ew berdewam bîn bijîn li ser Mêyflewerê ħeta qabînêt xu li ser 'edrê ava kirin. Li demê çar heyvêt ewilî, 47 ji 102 miruv ji nesaxîa mirin.



www.chnm.gmu.edu

Dû Hinduk hebîn, yêt zimanê Inglîzî zanî. Her dû harî karîa Ḧecîa kir da digel cîranêt wan bi aştîê biaxivin. Navê êk ji wan Skwanto bî. Wî çandin, nêçîr, masîgirtin u cilik çêkirin nîşa Ḧecîa kirin da birsî ne bin.

Navê miħafizî Ḧecîa Bredfird bî. Navê rêberê Hinduka Mesesoyt bî. Bredfirdî gut dê rojeka supasîê ya bigiştî bu Xwidê li heyva deh hebit. U Bredfirdî jî Mesesoyt mêhvan kir roja supasîê. Mesesoyt rojekê zî hat u 90 Hinduk li gel xu înan. Ew Hinduk ħeşt xezal u pênc 'alukêt kîvî u heşt babetêt deramet li gel xu înan da bixwin. Jinêt Hinduka nîşa jinêt ħecîa çawa genim şamî u kêkêt fêqîê u kastirê ji arê genimî çêkin! U paşî her dû Ḧecî u Hinduk li gel êk u dû xwar u ew jî yarîa xuş ji der ve kirin – bu çar roja!



www.bookmakersltd.com

Li sala 1789 reîsê Emrîke yê ewilî, Corc Waşîngten, gut 26 bi heyva yazde ew roj ku ħemî Emrîkî dê supasîa Xwidê bikin bu xêra Xwidê. Piştî hingê reîse Îbrahîm Linkin gut ew roje dê bit pêncşembê dîmahîê bi heyva yazde. U dîmahîê li sala 1941 reîs Franklin Rûsevelt gut Roja Supasîê dê bit pêncşembê çarê li heyva yazde.

Roja Supasîê rojek gelek xuş e! Em li gel miruvêt xu ne u li gel êk u dû dixwîn. U xwarina me gelek xuş e – 'aluk u pitat u kastir u nan u xwarinêt şirîn ji kolindê zer çêkirî. **Cejina we pîruz bit!**



© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Azadîa rastî çi ye?

## Sala 1906

Ji berî sed sala, welata Emrîke gelek feriq bî! Li sala 1906:

- Jina mafê dengdanê ne bî.
- Behira pitir miruv dimirin ji berî 'emirê 50 sala.
- Dû ji deha mezin ne şîa binvîsit yan bixwînit.
- Bes şeş ji sedê Emrîkî ji xwandingeh amadeî şihade wer girtin.
- Bes 14 ji sedê xanî mezelka ħemam yan banîo hebî. (Heker ne bî, teşteka mezin tijî av dikir u her miruv li malekê serê xu şîşt êk êk.)
- Behira pitir jinik bes êk carê heyvê pirrça xu şîşt. Zerika hêkê bi kar înan da bişut.
- Bes heşt ji sedê xanî telefun hebî.
- 8000 seyare hebîn. Behira pitir rêk ji axê u bera çêkirîn.
- Ħeqê şulê behira pitir miruva $0.22 se'etê bî.
- Ħeqê şulê behira pitir miruva navbeyna $200 – 400 salê bî.
- Ħeqê telefunê bu sê deqa ji Kaleradu ħeta Nîw York $11 bî.
- Ħeqê erzaqa husa bî: pewndê şekirê $0.04; duzde hêk $0.14; pewndê qehweî $0.15.
- Behira pitir jinik maîn li malê wextê biçîk bîn u ne çûne xestê.
- Not ji sedê dixtur ne çû bîn kûllîê. Çû bîn medresêt zanistî, belê ħikmeta Emrîkê gut ew medrese ne gelek baş bîn.
- Behira pitir armancêt mirnê ji kulatîê singê yan sil yan zikê çûn yan dilê yan celta mejî bîn.
- 45 wîlayet yêt Emrîke hebîn. (Nuke 50 hene.) 'Elema Emrîke bes 45 stêr hebîn.
- Hejde ji sedê xanî êk yan pitir xulam yan xudam hebî. Emrîke jî welatekê muhacira u insanîa bî.

U ji ber hindê arîş (mişkîle) hebîn yêt dînî u zimanê u sîasî.



Ted Rûsevelt
www.whitehouse.gov

Ted Rûsevelt (reîsê Emrîke yê jimara 26) gut, "Heker divîa ev welat xirab bin, dê hêlit ew bibit girêbîneka millet ku gel êk u dû şerrî bikin." [Reader's Digest, Oct.ober 2006, p. 106]

Li Emrîke guharrtin piç piç we lê dikit. Belê li Kurdistanê guharrtin nuke gelek zî we lê dikit.

Li sala 1906 Kurdistanê jî gelek feriq bî! Navbeyna Osmanî Tirkîe u Îranê bî. Bes 12,000 miruv jîan li Suleymanî. (Evro 800,000 miruv in!) Miruv wek Pîremêrd dest pê kir bi zimanê Kurdî binvîsit (bi Soranî). (Rojnama 'ewilî hat destpêkirin li sala 1898.)

Pisîarêt min bu we eve ne: Erê hîn çi dikin kirîar da Kurdistan bibit cihekê azadî? Erê serbestîya dînî heye (ya rast u ne bes bi axiftinê)? Erê serbestîya axiftinê heye? Erê her ħemî kes miruv êk rêz in? Erê jinik tînin rêza zelama da dengê xu bidin u da şul bikin u da şî ne kin heker ne vên u da seyare bihajon heker divên? Rastî?

Azadîa we heye. Bila bi kar bînin da welatê we cihek baş bit – bu ħemîa – bu feqîra, zêngîna, bîanîya, Kurda, ne Kurda, Izidîya, Biserrmana, Mesîhîya. Azadî tiştek hêja ye.

**Her dem çêtir e heker tu rastîê bêjî li jîana xu ya taybet u herwesa digel komelê.**

- Corc Waşîngten (reîsê 'ewilî yê Emrîke)




© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Danîal

*Ev çîroke rast e. Beĥsa hindek zelam yêt serbestîya sîasî ne bîn, belê serbestîya gîanî bîn. Serbestîya dînî hilbijartin – hilbijartin ew êk Xwidê yê rast îbadetê bikin (u ĥecku bimirin) pêşve bijîn u xizmeta paşaî bikin heker ew paşaye îbadetê Xwidê yê rast ne kit. U Xwidê bu hilbijartinêt wan xelat kirin.*

Ji berî 2600 sala Nebuxeznasirî paşayê Babil bî (yê 'Îraqê kevin maî). U wî hircîmî Urşelîmê kir u bi ser ketin. Paşî paşaî serukê fermana Eşiftireî serukê xulamêt xu kir ku ji nav Îsraîlîya ji dwîndeha mezin u paşa gencêt jêhatî u lêkdaî, cuan u zîrek u hemî karade amade biken zana bin u baş bizanin u ew bin ewêt kêrî ber destê paşaî bên rojane dîarkirin da fêrî nivêsîna kildanî bin u fêrî zimanê wan bin. U paşî bu wan parêt rojane tirxan kirin roj bu rojê ji xwarna paşaî u meyî u şeraba wî u ferman da kusê sala li ber xwêndin u rewşenbîrîê bin, u dîmahîa sê sala dê li ber destêt paşaî bin. Ewêt ji Îsraîlîya hilbijartîn çar bîn ew jî: Danîal, Xenanîa, Mîşaêl u 'Ezerîa.

Hindî Danîal bî birîar li gel deruna xu kir ku ew xu pîs ne kit bi xwarin u vexwarna paşaî ve. Ji serukê xulama xwast ew li wî biburit. Xwidê vîan u xuşewîstî dana Danîalî li nik serukê xulama. Îna guh da daxwazîa wan çunku rengê wan xuş u baştir xu ya u zexim u qelewtir bîn ji ĥemî genca ewêt xwarna paşa dixwarin. Îna zêrevanî tiştê bu wan hatî ye danan ji xwarin u vexwarnê bi keskatîê guhart.

Xwidê ew her çar xurt bizanîn u huş u zîrek di ĥemî rengêt nivisînê u zanînê xelat kirin. Danîal gelekê zîrek bî di tefsîra xewna u ĥemî dîtina. Demê nêzîk bî ew katê amadebîna wan li ber paşaî li ser fermana wî. Serukê xulama ew înane ber Nebuxeznaserî. Îna paşaî li gel wan axift ji nav wan ĥemîa kesek ne dît wekî Danîal u Xenanîa u Mîşaêl u 'Ezerîa. Îna hilbijartin da biçine amadebîna wî. Demê paşaî dest pê kirî li gel wan li ser karêt zanîarî u zanistî axiftî dît ew deh carkî ji hevîbend u mecusêt li welatê wî rîniştî çêtir dizanin.

Li sala dûê ji paşatîya Nebuxeznaserî, Nebuxeznaserî xewnek dît xewneka ne xuş xew jê revand. Ferman da hevîbend u mecus u zana u stêrnas bên xewna wî bî ruhin bikin. Îna hatin li ber amadebîn. Îna paşaî gute wan, "Min xewnek dît deruna min ne xuş kir, u reĥet nabit ĥeta xewnê u ruhinkirna wê nezanit." Bi aramî bersiv dan, "Her bijî ey paşa. Xewna xu bu xulamêt xu bêje da ruhin bikîn." Îna paşaî gute wan, "Fermana ji layê min derkeftî heker hîn vê xewnê ji min venekin u ruhin ne kin, hîn dê êne parçe parçe kirin u xanîêt we dê kavil bin. U heker we xewn ruhin kirin dê xelat u başî ya li gel we kim, u bi destê vekirî dê dime we. Nuke xewnê u ruhinkirna wê bu min bêjin." Careka dî bersiva wî dan, "Bila paşa xewna xu bu xulamêt xu bêjit dê bu wî ruhin u dîar kîn. Belê ne şîa bêjit xewnê paşayê çi bî çunku Xwidê bi tinê şîa nîşa miruva bidit!" Hîngê gelek kerbêt paşaî vebîn u ferman da binehêlana ĥemî danayêt Babil. Husa ferman derket biguştina ĥemî danaya, u ew kes hatin ewêt Danîalî u hevalêt wî bigirin da wan ne hêlin. Îna Danîalî bi hizir u dîr bînî ber paşaî amade bî u jê xwast mihiletê bidetê da ruhinkirina xewna wî bu dîarbikit u bêjit. Paşî Danîal çû mal u gute hevalêt xu (Xenenîa, Mîşaîl u 'Ezerîaî) sebaret vê fermanê da lê burînê ji Xwidê esmana bixwazin derbareî vî nepenî (bi dizîkî ve) u nedîarîê da Danîal u hevalêt wî tê ne çin li gel zana u danayêt Babil. Hîngê nepenî didîtina şevê da bu Danîalî dîar bî. Xudayê esmana pîruz kir u gutê, "Bila Navê Xwidê pîruz bit ji kevinda u ĥeta ĥetayê çunku wî danaî şîan ya hey."

Paşî Danîalî gute Erîuxê ewê paşaî virêkirî bu nehêlana danayêt Babil: "Danayêt Babil ne kuje. Min bibe pêş paşaî dê bu wî dîar kim ruhinkirna xewna wî." Erîuxî lez li amadebîna Danîalî kir bu pêş paşaî u gut, "Min zelamek dît ji nav bendêt Cihî da ew dê ruhinkirna xewna paşaî bu bêjit." Paşaî pisîara Danîalî kir, "Tu dê şêî xewnê bu min bêjî ewa min dîtî u bu min ruhin bikî?" Danîalî bersiv da, "Hevîbend yan mecus yan stêrnas ne şên nepenîa paşaî ji wan xwastî bizanin u bêjin. Belê Xudayek yê li esmana hey nepenîa dîar dikit u gute paşaî ka dê çi çê bit li dîmahî ya roja u hindî xewna te ye ya te di xewa xu da dîtî eva heye. Ey paşa demê tu drêj kirî li ser cihê xu hizir ketine serê te da ka dê çi çê bit rojêt bêt u ewê nepenîa dîar dikit gute te ka dê çi çê bît. U bu min ew nepenî dîar kir, ne ji ber danayî ya min ya pitir ji ĥemî saxa, belê da paşa bête agehdar kirin bi ruhinkirna xewnê u da tu hizirêt dilê xu bizanî." U Danîal xewnê paşaî dirist gut u jî ruhinkirna wê. U paşaî gute wî, "Rast e Xwidê we Xwidê xuda ye u Xudanê paşaye u derkirê nepenîa ne, çunku te şîa vê nepenîê dîar bikî."



www.lavistachurchofchrist.org

Piştî hîngê paşaî mezin kir u gelek xelatêt mezin danê u ew kire deshelatdar li ser ĥemî Babil u kire mezinê ĥemî zanayêt Babil u mîrekêt wan. Danîalî ji paşaî xwast ku hevalêt wî (Xenenîa, Mîşaîl u 'Ezerîaî) danite ser devera Babil bu bi rêvebirna kar u barê wê. Paşaî ew kir. Hindî Danîal bî ew ma durdîa paşaî de u li wêrê ma.

- ji pertuka Danîalî 1-2

"Jîn" guvareke têtê nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara guvarê bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Jîn



## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Roja Supasîa

**BERAMBERÊ →**

**3** xêzan
**4** navê miħafizî yê Ħecîa
**6** fisteq
**8** afka goştî
**9** memnun
**12** ħedîqe
**13** genim şamî
**16** kolindê zer
**17** mirebe
**18** çay
**19** tov
**20** Hinduk
**23** çinîn, biçine / dirîn, bidrî
**24** gêzer
**26** pêncşemb
**28** qehwe / neskafê
**30** gemî
**33** Çirîa Dûê / heyva yazde
**34** semun
**36** çandin, biçîne
**37** goştê xezalê

**XWARÊ ↓**

**1** nivişk
**2** pitat
**5** ava fêqî
**7** bê xwarin
**8** lubik
**10** navê serukê Hinduka
**11** ħecî
**14** navê Hindukê ku harî karîa Ħecîa kir u ku Inglîzî zanî
**15** ‘elu’eluk
**21** deramet
**22** Emrîke
**24** xanîê biçîk yê ji dara çêkirî
**25** xezal
**27** azadî
**29** masî
**31** kastir
**32** Holende
**35** yarî



# Thanksgiving








*[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêt dê ête belav kirin.]*

“Jîn” rujnameke tête nivîsîn ji laê Şirînê. Heker te jimara rujina bivêt, îmêla xu bu min virêke: jeenuazadi@cs.com

© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

# Îmêlêt We

Ev demê te baş.  Ez gelek supasîa te dikim bu îmêla te u ez gelek faxirê bi te dibim ku tu husa fêrî Kurdî bûî.  Hîvî dar im her berdewam bin u dê li hîvîa “Jîn” bim ħemî heyva.

Careka dî supas u bi xêr bimînî.

S.F.

Xoşka Şirîn

Silav.


Guvara te baş e!  Xwidê ji te razî bit.

S.A.M.


ji meha burî:

# Bersiva Xwarin

### Food











© 2006 by Şirîn.  All rights reserved.  This publication may not be sold, except by the author.  It is for free distribution only.

# Zanîarîêt Pêtivî bu “Texmînê Bike!”

Ev yarîe yarîa wêne çêkirnê ye. Ĥemî kes dişên vê yarîê bikin. Dû miruv yan sê miruv yan her jimareka hebit. Herwesa tu dişêî wekî tîma yarîa bikî. Li destpêkê da pêtivî ye tu van karta jêk cida bikî. Van karta bi meqesê qet ke. Piştî qetkirna her perrekê dê te neh karte hebin.

**Texmînê Bike!**
© 2006 by Şirîn
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

KÎ? (miruv)
*Who? (people)*

KÎVE? (cih)
*Where? (location)*

ÇI? (tişt)
*What? (something)*

ÇAWA? (bizav)
*How? (action)*

BUÇÎ? (ĥemî tişt)
*Why? (miscellaneous)*

## Destpêka Yarîê

Ew kesê kartê di destî da (ewê kartê hildigirit), pêtivî ye ew kesê dî yêt tîma wî nezanin çi li ser kartê ye. Demê tu seĥ dikî kartê babetekê (Kî? Kîve? Çi? Çawa? Buçî?) hilbijêre ku ew babeta tu dê wêne çêkî bu tîma xu. U çênabit tu biaxivî. Bes wênê çêke. Belê tîma te hewl didin bizanin ew wênê ya çi ye. (Babetê texmîn bike!) Belê hevberê te jî dê rengî tiştî çêkit ewê we hilbijartî. U dê wênê bu tîma xu wêne kit. U ew kesê yan tîmê bizanit ew wênê ye ya çi ye, ew dê pile wer girit.

◄ Karta ewilî (ji heyva burî) naête bi kar înan, belê taybete bu nimune da tu bizanî babetêt di yarîê çi ne:

Kî? = bu wênêt miruva diête bi kar înan

Kîve? = bu wênêt ciha yan bajêra diête bi kar înan

Çi? = bu wênêt tişta diête bi kar înan

Çawa? = bu wênêt bizavkirnê yan bizavkirna diête bi kar înan

Buçî? = bu wênêt ĥemî karêt zeĥmet yan qurs diête bi kar înan

Karta dûê (ji heyva burî) wekî evê çende ye: ►

Ew kesê karte di destî da brîyarê dit, êk ji van babeta hilbijêrit. Bu nimune Çi? se’et, belê **çênabit tu hevberî xu agehdar kî yan bêjîê te çi hilbijartî ye**. Belê pêtivî ye tu bêjîe çi babete wekî “Çi?” yan “tişt” ku da bizanit babetê wî çi ye.

Piştî te babet hilbijartî, u te gute hevberî xu babete çi ye (Kî? Kîve? Çi? Çawa? yan Buçî?), dest bi çêkirna wênê bike. **U çênabit ebet biaxivit**, ew kesê karte di destî da u wênê çêkdikit.

Li vî demî hevberê te bizavêt dikit da bizanit ka wênê çi ye ewê tu çê dikî. Dest bi axiftinê bike u mebesta wî ewe: bizanit ew tu çi çêdikî. U ew kesê wênê çêkdikit pêtivî ye wênekî ku hevberê wî bizanit ew wênê ye çi ye.

Ev karê he herwesa diête kar înan bu yarîa tîma. Belê pêtivî ye ew kesê li êk tîmê da wênêt wek êk dirist bikin da êt beramberî wana bizanin ew wênê ye çi ye.

Ev yarîe gelek xuş e u her kesêk dişêt vê yarîa bikit. Belê xuştir e dibit heker pitir ji çar kesa yarîa bikin.

Ew kesê me’na yan qesa (bi nimune “se’et”) hilbijêrit yan bizanit, ew kese dê pileyekê wergirit, yan tîma wî pilê wergirit. U ew dest bi yarîê dikit.

**Texmînê Bike!**
© 2006 by Şirîn
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

êxtîar
*elderly*

bend
*water*

se’et
*clock (f)*

dan, bide
*give (v)*

cil u berg
*clothes and accessories*

Yarîekî xuş burîne!☺


© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Mes'ud Barzanî — *Masoud Barzani (president of the KRG)*
- Dihuk — *Dohuk*
- gindur u zebeş — *canteloupe and watermelon*
- vekirin, veke — *open (v)*
- Were! Herre! — *Come! Go!*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- zana — *scientist*
- Pirra Delal — *"Beautiful Bridge" (in Zakho)*
- xerrîte — *map (f)*
- rakirin, rake — *put away (v)*
- sanahî — *easy*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Zekerîe — *Zacharia Abdullah (singer)*
- Helebce — *Halabja (5000 Kurds were gassed by Saddam)*
- çav u birî — *eye and eyebrow*
- rawestan, raweste — *stand up (v)*
- bêhin teng — *impatient*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- penaber — *refugee*
- şikeft — *cave (f)*
- programa televizîunê — *TV program (f)*
- axiftin, biaxive — *talk (v)*
- sur u zer — *red and yellow*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- jin — *female*
- gelî — *valley*
- kasik u pîale — *saucer and tea glass*
- fêr kirin, fêr bike — *teach (v)*
- roja deykbînê — *birthday*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Mem u Zîn — *Kurdish love story (like Romeo and Juliet)*
- Selaĥedîn — *Salahaddin*
- xwarin u vexwarin — *food and drink*
- nivîsîn, binvîse — *write (v)*
- meşhur — *famous*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Celal Talebanî — *Jelal Talabani (president of Iraq 2005)*
- çul — *desert*
- tîj — *spicy*
- xastin, bixaze — *ask (v)*
- bi lez u bez — *frantically and quickly*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Leîla Qasim — *Leyla Qasum (politician who was executed)*
- qebir — *cemetary (m)*
- bazink u gustîrk — *bracelet and ring*
- kum kirin, kum ke — *collect (v)*
- naciĥ — *successful*

## Texmînê Bike!

© 2006 by Şirîn - jeenuazadi@cs.com
not to be sold except by Şirîn; for free distribution only

- Nasir Rezazî u Merzî — *Nasir Rezazi and his wife (singers)*
- Se'udîe — *Saudia Arabia*
- zengiluk — *icicle (m)*
- kapî kirin, kapî bike — *copy (v)*
- xizîne — *treasure (f)*

# Cejina We Pîruz Bit!

Ev wêne dirist kirin ji laê Gulzar Saliḧ, Emrîke, 2006.





© 2006 by Şirîn. All rights reserved. This publication may not be sold, except by the author. It is for free distribution only.